
# VORLESETIPPS

› Kurdische Version

**Dê û Bavên Hêja,**

Hûn bi xêr hatine „Wolle liest“ (Hirço Wolle dixwîne). Em dixwazin bi vê projeyê, kêfxweşîya we ya di xwendina we ya bi zimanê we yê malbatî xurttir bikin û di vî warî de hin şîretan li we bikin.

Em di xwendina pirtûka digel zarokê we de ji we re kêfxweşîyê dixwazin. Heger pirseke we ya debarê xwendinê de hebe, hevkarên me yên li dezgeha me di xizmeta we de ne.
Heger wekî din pêşnîyar, pirs û daxwazîyên we yên ji bo wergerandina bi zimanên din yan jî xetayên di wergerê de hebin hûn di dikarin xwe bi rêya Emailê bigihînin Xanim Dr. Maren Risch, maren.risch@vhs-wolfsburg.de yan jî hûn dikarin telefûnî vê hejmarê bikin: 05361 89390-82.



## Lez nekin, bi bêhna fireh!

Hêdî hêdî û bi vekirî bixwînin. Carna bêhna xwe vedin û di dema xwendinê de li zarokê xwe binêrin. Dema ku hûn pirtûkê dixwînin, cîhazên wekî televîzyon, radyo, komputer, tablet û telefûnên biqail vemirînin, ku bala zarokê we belav nekin!



## Ji xwe re bikin adet!

Pirtûka xwe her tim di heman wext de yan jî di heman boneyê de bixwînin, wekî mînak, berîya razanê, rojên yekşemê li ser text yan jî piştî nîvro, piştî serşûştinê… ji xwe re hawîrdoreke rehet çêbikin, wekî mînak, ji bo paldanê balîfan deynin pişta xwe…





## Bila zarok pirtûkê hilbijêre!

Ji zarokê xwe re wan pirtûkan bixwînin, ku li gor temenê zarokê we bin. Wan mijaran hilbijêrin, ku bala zarokê we bikişînin û di jîyana wî de derkevin pêşîya wî. Heger kêfa zarokê we ji pirtûkê re nehat, dev ji wê pirtûkê berdin û ji xwe re pirtûkeke nû hilbijêrin. Heger kêfa zarok ji wê pirtûkê re hat, hûn dikarin wê pirtûkê çendîn carên din dîsa bixwînin- Kêfa zarokan jê re tê, dema ku ew bikaribinin di dema xwendinê de ji ber xwe jî tiştan bêjin, ji ber ku ew êdî pirtûkê nas dikin.



## Dengekî bidin pirtûkê!

Li gor lehengên pirtûkê dengê xwe bilind yan jî nizm bikin. Bi bizavên serçavê xwe yan dest û milan rihekî bidin pirtûkê.



## Bihelin zarok bikevin navberê û pirsan bikin!

Dema xwedinê, ji serî heta dawî di carekê de nexwînin. Bihêlin zarokê we pirsan bike û li ser çîrokê bipeyive. Zarok rewşa xwe û çîroka di pirtûkê de bi kêfxweşî didin ber hev.



## Xwe bi nivîsarê re girê nedin!

Hû dikarin çîrok kintir û sadetir bikin. (şîreteke din: Heger hûn pirtûkê çendîn caran ji nû ve bixwînin, hûn dikarin hin derên çîrokê kurt bikin.)
Bala xwe bidin, heger zarokê we aciz bûye yan na û li gor wê yekê gavekê biavêjin.



## Bi zarokê xwe re li ser pirtûkê bipeyivin!

Bi her pirtûkekê re zarokê we hînî tiştekî nû dibe û bi kêfxweşî li ser wî tiştî dipeyive, behsa wî dike.



## Pirtûka bi wî zimanî bixwînin, ku hûn dikarin herî baş pê bipeyivin!

Her zimanek, ku bi bilêvkirin û rêzimanê rast hatibe hîn bûn,  alîkarîya zarokê we dike, ku bi rehetî  zimanên din jî hîn bibe!

Mehr unter: